

# OROJA NÛ

*kovara huneri çandi û edebi*

## NEWROZ



M.M.Sa

1985  
8

## NAVEROK

Nameyêن Xwendevanan . . . . .	3
Disêrtasiyêن Kurdnasiyê . . . . .	4
Eladdin Seccadi . . . . .	8
Hevpeyvin . . . . .	9
Helbest . . . . .	12
Kovara "JİN" . . . . .	14
Dengbêj Kerem . . . . .	15
Newroz - 85 . . . . .	16
Fatê . . . . .	18
Ferikê Usif . . . . .	21
Dengbêjeki Çiyayê Kurmênc . . . . .	22
Jî Nav Edebiyata Cihanê - HUGO . . . . .	23
Hemid Bedirxan . . . . .	25
Çirok . . . . .	26
Jî Nav Weşanan . . . . .	30

Sal : 6  
Hêjmar : 51

**XWEDI : KOMKAR - Swêd**  
**BERPIRSIYAR : Rohat**  
**NAVNIŞAN : Karlbergsv. 32 B. nb**  
**113 27 Stockholm**  
**TELEFON : 08/ 32 82 51**  
**HESAP NO : PG. 458980 - 0**

**UTGIVARE : Svensk-Kurdiska**  
**Arbetar Föreningen**  
**ANSVARIG UTGIVARE : Rohat**  
**ADRESS : Karlbergsv. 32 B nb**  
**113 27 Stockholm**  
**TELEFON : 08 / 32 82 51**  
**PG : 458980 - 0**

Hevalên Hêja,

Dî warê pêşketina edebiyat û çanda kurdi da, derketina kovara Roja Nû serfirazike mezine. Lî Kurdistanê, dî nav merc û hoyê kolonyalist da çanda me pêşî lê hatiye bendkîrin, jiber vê yekê derketina kovara Roja Nû bê şik alikarike gelek mezine jî bo pêşketina çanda me.

Hêzên kolonyalist cara pêşin êrişên xwe dajon lî ser çanda me, ew dixwazin gelê me dirok û çanda xwe jî bir bike. Bî vi tehri dixwazin ew beghêjin armancê xwe.

Lî hemberi van hemû zordes-tiyan, qırkırin û tunekîran, gelê me bî mîrxasi berxwe dîde, tekoşina xwe nade sekînandin. Roja Nû perçeki vê tekoşinê ye, em bî çaveki qenc karêن we pêkol dîkin. Jî ber vê yeke, jî vir şunda jî her hejmarêن Roja Nû, mera 10 heban bisinîn.

Bî silavên germin...

ZINAR

İsviçre

Hevalên hêja, Silavê me jî we hemûyan ra hene.

Em xortêن gundê Nışabiyê(Damas) ne. Hejmara 50 ya Roja Nû ke-te destê me. Me ew xwend û dî nav me da hin ji digere,, jî bo ku pir kêfa me pêra hat.

Em dixwazin ku hûn ji me ra herdem hemû hejmarêن wê bisinîn.

Xortêن Nışabiyê SURİYE

Hevalên hêja,

Em cejna we hemûyan bî dîl û can piroz dîkin. Hêviya me ewe ku cejna Newroza isal jî bo yekiti û piştgirtiya şoreşger pêşverû, demokrat û welatparêzan roleki mezîn bilize.

Silavên birati...  
Bî navê Komela kurdêن Austîralya  
Hevalek

Hevalên hêja,

Weki tê zanîn, kovara "Roja Nû" kovareke huneri, çandi û edebî ye, ya ku tenê bî kurdi tê weşandin. Heta niha min kovareke vaha rind nedît û bî dest nexist. Hemû hejmarêن Roja Nû ba min hene. Lî ez gelek pê dîlxwes dibim.

Ez hemû kesan ra pir sîpas dîkim, ku keda wan dî derxîstîn, çapkîrin û belav-kirna vê kovarê da hene.

Hogirno!

Daxwaziyek min jî we heye. Vaha ku Hun nîkanîn dî hejmarêن nûyan da cih bidin pêkenîyan, yêن Kurdi, yan jî dî zîmanêن din, (zîmanêن biyani) da hatîne wergerandin.

Hevalno

Her tişt rind e, baş e, lî ez nîzanîm ku ..Roja Nû " jî çend mehan da tê weşandin. Carek em wê her du mehan da , carek ji dîbe ku her sê mehan da dis-tinîn . Hûn nîkanîn wê dî her meheki da bîweşinin. Dû û sê mehan da carek pir dereng dîbe. Ez tîmê lî hêviyê wê dîminim, aha iro tê aha sîbe tê.

Dî jin û karên we yêن şoreşgeri da serfirazi û serketin jî we ra be.

Silavên germin û şoreşgeri.

Hevalê we yê BEYRO

# DİSERTASIYÊN KURDNASIYÊ

Prof. QANATÊ KURDO

Serokê  
Koma Kurdnasên Leningradê

Hewaskari û berjevendiya goveka cîmaeta xelqên Sovêtistanê, ya goveka zanyar û ulmdarêne welatê Sovêtê li ser lêgerin û vekolina tarix, edebyat, ziman, folklor û êtnografiya miletê Kurd baştûrin têne ber çavan, çaxê em bala xwe didine ser tarixa nivisandin û pawankırına disertasiyê (nivisarêne zanyari) Kurdnasiyê.

Tarixa kurdnasiya Sovêtistanê nişan dike, ku merkezên nivisandin û pawandina disertasiyê kurdnasiyê şeherên Moskva, Leningrad, Baku û Erêvan bûn. Li nav van bajaran da ji sala 1940 heta van salêna paşin li Sovêtistanêda heta 75 disertasiyê zanyari yê navê kandidat û doktorê zanyari hatine nivisandin û pawankırınê. Jî van her çar şeheranda, dî vê pîrsêda Moskva, Leningrad ciyê ewîl (pêşin) digirin. Jî wan 75 disertasiyan jî siyi zêdetir disertasi li ser tarixa kurdan, êtnografiya kurdan, li ser şerê wani azadbûnê yê sedsaliya XIX û yê sedsaliya XX hatine nivisandinê, heta bist disertasi li ser ziman û zaravêne kurdi hatine nivisandinê, 16 disertasi jî li ser edebyat û folklora kurdi hatine nivisandinê. Li vira dîvêt bêjim, merîvên ev disertasi nivisine û pawan kırine, bî eslê xweva piraniya wan kurd bûne. Eva yeka politika miletan ya partiya welatê Sovêtê nişan dike, ew ruhê intêrnasionaliyê û yê sazmaniya cîmaeta Sovêtistanê tine ber çavan û nişan dike, ku hewaskari û berjevendiya goveka zanyarêne Sovêtê bî lêgerîna jiyin, ayin, tarix û kultura milletê kurdava heye.

Ez li vira navê hemû disertasiya dînivisim, ku xwendevanê me delal baş haj pê hebin, kî li ser çi, li kiderê û kengê xebata xwe nivisine, pawan kırine û navê andamê zanyari standine.

## Disertasêyên Lî Ser Tarix, Etnografi û Malhebûna Miletê Kurd Nivisandi :

- 1 — Eminê Avdel, Jîna Kurd (nivisara etnografi), Erêvan, 1948
- 2 — G.B. Pîrsa Yekbûna biletê Kurd li Iranêda, M. 1952. Disert. Kand.
- 3 — T.F. Aristova, Kurdên Iranê (nivisara tarixi-êtnografi), Moskva, 1963, Disert. Kand.
- 4 — Eli Gêlavê, Peyvediya Axê li Kurdistana Iranêda. Baku, 1965, Disert. Kand.
- 5 — R.Gazi, Partiya Dîmoqratiyê ya Kurdistana Iranê, Baku, 1965
- 6 — C.Celil Şerê Kurdan yê Azadbûna li Nav Salêna 1850-1880, Dêsert. Kand.
- 7 — Mamêd Nazarov, Kurdên Turkmenistanê (nivisara tarixi-êtnografiye), Moskva, 1956, Disert. Kand.
- 8 — A.Şemzini, Şerê Azadbûna Miletê Kurd li nav Salêna 1940-1948, Leningrad, 1959, Disert. Kand.
- 9 — Şekro Mihoyan, Tevgera Azadbûna Miletê Kurd li Iraqêda, li Paşî Şerê Dînyayê Duwemin, Erêvan, 1963, Disert. Kand.
- 10 — A. Mînteşâşvili, Çend Pîrsêd Tevgera Azadbûna Miletê Kurd li Iraqêda li Nav Salêna 1919-1925, Tibilisi, 1963, Disert. Kand.

- 11 — K.Keftan, Rabûna Barzanêya wek Belgeki Çirûsi li Nav Şerê Azadbûna miletê Leningrad, 1964, Disert. Kand.
- 12 — K.Muzher, Tevgera Neteweyê Kurd ya Azadbûnê I Kurdistana Iraqêda, li nav salên 1918-1958 Baku, 1956, Disert. Kand.
- 13 — M.İ.Şemsi, Nîvisara Şeref-Xan Bitlisi, "Şeref-name" wek kaniya lêgerina tarixa neteweyê kurd, Baku, 1967, Disert. Kand.
- 14 — M.S.Lazarêv, Meselên Kurdan li Peyvendiya Navnetewyêda Lı Rojhilata Navinda (li axırıya sedsalêy XIX heta salên 1967), Moskva, 1968, Disert. Kand.
- 15 — G.B.Akopov, Tarixa Rexnegiriyê ya Problêma Peydabûna Kurdan, Êrêvan, 1968, Disert. Dokt.
- 16 — S.C. Eşiryan, Tevgera neteweyê Kurd li Kurdistana Iraqêda li Nav Salên 1961-1968, Disert. Kand.
- 17 — A.E.Dilsêz, Problêma Serxwebûna Kurdan li Nexşê Extyariya (mafê) Navnetewyan, Moskva, 1971, Disert. Kand.
- 18 — X.Barzani, Partiyêni Kurd yên Siyasetê û Sazmanêni Kurdan Derheqa Pîrsa Azadbûna Kurdanda, Moskva, 1967, Disert. Kand.
- 19 — D.F Sago, Prinsipê Serxwebûna Miletan û Rewşa Kurdan Lı Iraqêda. Kiev, 1972, Disert. Kand.
- 20 — A. Husni, Problêmén demografiyê li Kurdistana Iraqêda, Moskva, 1972 Disert. Kand.
- 21 — m.A.Mayrapov, Kurdistana Iraqê. Nîvisar li ser abûre û gêografiyê, Minsk, 1972 Disert. Kand.
- 22 — K.A.Amoêv, Rewşa Abûre li Kurdistana Iraqê, Baku 1973, Disert Kand.
- 23 — Tagi-zadê Tagi Sayfullaev, Tevgera Azadbûna Miletê Kurd li Kurdistana Iranêda, Maxaç-kala, 1974, Disert. Kand.
- 24 — M.X. Ali-Arif, Etnografiya Kurden Nehiya Sulemaniyê (Iraq), Moskva 1974, Disert. Kand.
- 25 — Nazım Casim, Lêgerin û Vekolina Xan-manê Jiyinê li Kurdistana Iraqêda, Kiev 1976, Disert. Kand.
- 26 — Ab.Cebar Qadir gafur, Tevgera Kurdan li Tirkiyêda dî Wextê Nav Herdu Şerên Dinyayê. Moskva, 1977, Disert. Kand.
- 27 — Wuriya Nuri Sayd, Arxêtâtktûra Xan-manê Jiyinê yên Senetê li Kurdistana Iraqê, Leningrad 1977, disert. Kand.
- 28 — E.I.Vasilêva, Kronoka Kosrov ibin Muhemed "Tarixa Bani Erdelan" wek kaniya lêgerina tarix û etnografiya kurdê Erdelanê li sedsaliyen XVIII-XIX, Disert. Kand.
- 29 — X.S.Mihoyan, Problêma Avtonomiya Neteweyê Kurd li Respûblika Iraqêda, Moskva 1977, Disert. Kand.
- 30 — Adnan Xaki Şêhat, Bergeyên Pêşveçûna Seentê li Bakura Iraqê, Moskva 1977, Disert. Kand.
- 31 — Cercis Hesen Abdula, Kurd li Jiyina Civaki-siyaseti li Suryêda, Moskva 1977, Disert. Kand.
- 32 — Hasix Gafur Ramadan, Problêma Kurdan li Sistêma Hevbendîya Navnetewyan li Wexti Herdu şerên Dinyayêda, Kiêv 1979, Disert. Kand.
- 33 — Pîstivan, Neriman Eziz, Arxêtâtktûra Komplêksen Sanitari yên Giştî li Kurdistana Iraqêda, Leningrad 1978, Disert. Kand.
- 34 — Omer Xaso, Problêma Kurdan li Paşı Şerê Dinyayê yê Duwemin.
- 35 — Devrêşyan Memo Xalatoviç, Heywanêni Gir yên Malhebûna kurdê Ermenêstanâ Rojhilatê, Êrêvan 1984, Disert. Kand.
- 36 — Poladyan Arşak Poxosoviç, Kurd li Nav Sedsalîyên VII-X, Êrêvan 1984, Disert. Kand.
- 37 — Karlêne Çaćani, Dostiya Miletê Kurd û Ermeniyan, Êrêvan 1962, Disert. Kand.
- 38 — O.L.Vilçevskiy, Kurd (pîrsa peydabûna wan), Leningrad 1960, Disert. Dokt.

### Disertasiyêni Lı Ser Edebyat Û Folklora Kurdan

- 1 — M.B.Rûdêenko, Dastana Ahmedê Xani, Mem û Zin", Moskva 1953, disert. Kand.
- 2 — Izzêdin Mustefa Resûl, Réalizm dî Edebyeta Kurdida, Baku 1963, Disert. Kand.

- 3 — O.Celilov, Dastana Kurdi ya Qeremaniyê "Xanê Cengzerin", Leningrad 1959, Disert. Kand.
- 4 — Şabil Eskerov, Efirandinê Şayirê Kurd yê Zemane Niha Cegerxûn, Baku 1962, Disert. Kand.
- 5 — M.Xeznedar, Kurtenivisar li Ser Tarixa Edebyeta Kurdi ya Zemanê Niha, Leningrad 1963, Disert. Kand.
- 6 — K.R.Eyubi, Efirandinê Şayirê Kurd Hejar, Leningrad 1965.
- 7 — Z.T.Şafiyêva, Janrên Dastanan li Helbestên Kurdida yê Zemanê Nihadâ, Baku 1967, Disert. Kand.
- 8 — Elisanov, Efirandinê Şayirê Kurd Gurân. Baku 1967, Disert.
- 9 — N.A.Cewari, Kîlamén Mîlete Kurd, Erêvan 1971, Disert Kand.
- 10 — Şukri Resûl İbrahim Bêndêni Kurdida yê Zemanê Nihadâ, Moskva 1977.
- 11 — M.B.Rûdêenko, Dastana Kurdi ya Selim Suleman "Üsib û Zelixê" Moskva 1979, Disert. Dokt.
- 12 — Mirzoêv Knyaz, Pevgirêdana Edebyeta Azerbêcana û Kurdan, Baku 1978, Disert. Kand.
- 13 — Müsaêlyan J.S. Dastana Kurdi ya "Zembilfiroş û Şaxêd Wê" Folklori, Moskva 1979, Disert. Kand.
- 14 — Cimşit Heyderi, Tarixa Pêşveçûna Nîvisandina Çirokêni Kurd yê Zemanê Niha, Moskva 1980, Disert. Kand.
- 15 — Hesen Huseyn Şêx-Keban, Kovara "Hewar" û Rola Wê Di Pêşveçûna Kültûra Miletê Kurdida, Moskva 1983, Disert. Kand.
- 16 — Abdula Pêşêw, Efirandinê Piremêr, Moskva 1983, Disert. Kand.
- 17 — Mistoyan Çerkez Dadaşêviç, Şewqdana Jiyan mîletê Kurd di Litêratûra Ermeni Sovêtîda. Erêvan 1984, Diserd. Kand.
- 18 — Haci Cindi, Dastana "Ker û Kulik", Erêvan 1940, Diserd. Kand.

### Disertasiyên Li Ser Ziman û Zaravên Kurdi

- 1 — Yû, Yû. Avaliani, Cinav Di Zimanê Kurdida, Leningrad 1940, Disert. Kand.
- 2 — K.K. Kurdoêv, Çekirina fêlén bargirani Di Zimanê Kurdida, Leningrad 1940, Disert. Kand.
- 3 — İ.İ. Sükerman, Çivana Navan û Veguhatîna Fêlan di Zimanê Kurdida, Leningrad 1940, Disert. Kand.
- 4 — Ç.X.Bakaêv, Bernav Di Zimanê Kurdida, Moskva 1950, Disert. Kand.
- 5 — İ.İ. Sükerman, Navan Heyinê û Çivana van di zimanê Kurdida. nanê Kurdida, Leningrad 1963, Disert. Dokt.
- 6 — K.K. Kurdoêv, Rêzmana Kurdi Bi Matérialê Kurmanci û Sorani, Moskva 1965, Disert. Dokt.
- 7 — M.G. Xemoyan, Zaravê Behdinani yê Kurdêni Iraqê, Erêvan 1961, Disert. Kand.
- 8 — I.A. Smirnova, Çekirina Fêlén Bargirani Di Soranida, Moskva 1965, Disert Kand.
- 9 — Z.A. Yûsupova, Bernav û Paşnav Di Soranida, Leningrad, Disert. Kand.
- 10 — Kurdistan Mukriani, Tayinkirin û Teherêni Pevgirêdana Navan Di Zimanê Kurdida, Moskva 1976, Disert. Kand.
- 11 — N.M. Nasrin, Fel di Zimanê Kurdida, Baku 1965 Disert. Kand.
- 12 — İbrahim Eziz, Hevokêni Peyvendi di Zimanê Kurdida, Moskva 1966, Disert. Kand.
- 13 — Yû. Yû. Avaliani, Lêgerin li Ser Fêlén Bargirani û Bêjebendêni Fêlan di Zimanê kurdida, Tibilisi 1969, Disert. Dokt.
- 14 — Ç.X. Bakaêv, Zimanê Kurdêni Sovêtistanê, Moskva 1971, disert. Dokt.
- 15 — Abdurehman Maruf, tarixa Nîvisandina Ferhengêni Kurdi û Prinsipêr Tertibkirina Ferhengêni Kurdi - Rûsi, Leningrad 1971
- 16 — A.M. Mamêdov, Zimanê Xelecan, Baku 1969, Disert. Kand.
- 17 — Muhemmed Farux Omer-Sadiq, Çekirina Navan Di Zimanê Kurdida, Moskva 1977, Disert. Kand.
- 18 — R.L. Sabolav, Rêzmana Kurdi ya Tarixi, Moskva 1979, Disert.
- 19 — İ.A. Smirnova, Katêgoriya Cinsan Di Zimanên Iranida yê Zemanê Nihadâ, Moskva 1980, Disert. Dokt.

Lı jorê min yeko-yeko nav nişanên wan disêrtasiyan nivisin, yêñ liser tarix, êtnografi, edebyat, ziman û folklora mîletê kurd û kultûra wan hatîne nivisandinê. Xebera disêrtasi nişan dîke navê nivisara zanyari (ulmi), Lı Sovêtistanêda merîvê institût yan ji zaninga xîlas kîrbe, eger bîxweze mijûli pîrsên zanyariva bîbe, ew dîkeva aspirantûrê, bî serkariya doktorê zanyari yan ji profêstorê pêşezan, gerek lı nav sê salanda disêrtasiya (nivisara ulmi) lı ser problemekê bînivise, wê nivisarê lı komcîvina zanya-randa pawan bike, eger zanyaran bî razibûn nivisara wi qebûl kîrin, qîrar di-dim, ku navê zanyari bîdîne wi. Navê zanyari lı Sovêtistanêda du navin, yek jêra dibêjin "Kandidatê Zanyari", ya dîn jêra dibêjin "Doktorê Zanyariyê". Kandidatê zanyariyê nişandike, ku ew bûye andamê ulm yanê êzna wi heye lı nav koman zanyaranda mijûli lêgerina problêmên pêşê (seneta) xweva mijûl bîbe. Navê "Doktorê Zanyariyê" nişan dîke, ku filan kes zanyareki heri mezine, ku hemû pîrs û problêmên zanyariva mijûl dîbe, dîkare serweriyê lı xebatkarêن "endamê zanyari" bike, zanyaran hazır dîke, serkariyê lı nivisarêni aspiranta dîke (ulmdaran hazır dîke).

Lı vira pêviste bêjîm ku hemû disêrtasiyêñ jorin yêñ kurdnas bî qimet û nirxê xweva ne wek hevin. Her yek jî wan angori zanin û fehmdariya zanya-reki hatiye nivisandinê.

# edebiyata kurdi hostayeki xwe wînda kîr

## ELADDIN SECCADI

Niviskar û mamostayeki zimanê kurdi Eladdin Seccadi dî roja 13.12.1984 da lî Bexdayê çû ser heqîya xwe. Bî mirîna Seccadi ziman û edebiyata kurdi zana û ronakbireki hêja windakir.

Dî pêşxistin û dewlemendkirina edebiyata kurdi da ked û xîzmeta Eladdin Seccadi mezîn e.

Ew dî sala 1915'an da hatiye dîn yayê. Wek gelek hevsaliyên xwe, wi ji xwendîna xwe lî medresa dîni girtiye. Gelek salan lî Sulêmanniyê û lî Bexdayê dersdari û pêşnimêji (imami) kiriye. Jî salêن şesti hetani mirîna xwe lî Bexdayê mamostayê beşa kurdi bû.

E.Seccadi, dî nav xebata pêşdarîna ziman û edebiyata kurdi da bî salan xebîtiye û gelek efrandinê hêja aniye meydanê. Dî nav efrandinê wi da xebata wi ya here mezîn "Mêjûy Edebi Kurdi" (1952) ye, ku wi bo cara yekem diroka edebiyata kurdi nivisiye. Ev xebata wi ji du beşan pêktê. Beşê yekem bî giştî lî ser edebiyatê ye. Jî aliyê diroki va lî ser edebiyata kurdi radiweste û qasi bist şairên kurd (Jî Baba Tahir heta Melayê Ciziri, heta Bêkes) dide nasin. Paşê lî ser çirok, evsa ne û destanên kurdi radiweste.



Efrandinê Seccadi yên mayin evin.

\* "Rışteyi Mirwari" dî warê zargotina (folklor) kurdi da xebateke hêja ye. Têda çirok, destan serpêhati, gotinêن pêşîyan û hwd. bî awaki fireh cih dîgrin. "Rışteyi Mirwari" jî heyşt cildan pêktê.

\* "Geşt lî Kurdistan", ev seyahatname (Gername yan ji geştnâme) lî ser diroka bajarên Kurdistanê agadariyên hêja dîde.

\* "Hemişe Bahar" berhevoka çirokan ne. Dî navbera salêن 1930 û 1940'an da Eladdin Seccadi yek jî pêşengên çiroknivêsen kurdi tê jirmatin.

\* "Şoreşekani Kurd, Kurd û Komari Iraq", xebata Seccadi ya lî ser diroka Kurdistanê ya nêzik e. Pirtûk jî 363 rûpelan pêktê.

Dî derxistina hin kovar û rojnameyên kurdi da ji ked û xebata Eladdin Seccadi gelek derbas bûye. Jî sala 1938'an heta sala 1949'an serniviskarê kovara "Gelavêj" bû. Seccadi her usa xudan û berpîrsiyarê kovara "Nîzar" bû (1948 - 1949).

BI PEDAGOG

## Gunilla Lundgren

RA HEVPEYVİN

Gunilla Lundgren mamosta, pedagog û niviskar e. Heta niha sê pirtûkên wê derketine. Yek ji wan "Ett Möte" (hevditinek), li ser rewşa gelên Efrikayê, pêwendiyê kolanyalizmê babet digre. Dî vê pirtûkê da Lundgren bî zimaneki-hêsan behsa sedemên paşdamayina welaîn Efrikayê dike, û ji aliyê diroki va, ji bo zarokan şirove dike. Lundgren niha li taxên mihaciran li dorhêla Stockholmê, dî nav zarokên mihaciran da lêkolin û xebata xwe didomine. Roja Nû bî Gunilla Lundgren ra hevpeyvin ek çêkir. Lundgren weha bersiv da, ji bo pirsên me:

**ROJA NÛ :** Qasi em dizanın tu zê-detir dî nav zarokên mihaciran da dixebiti. Çima? Tu dikari şirovebiki?

**G.LUNDGREN :** Ez ji vir bist sal berê bûm mamosta. Ji despêkê da çawa min dest bî jiyana xebatê kîr, zarokên karkeran ji bo min bûn warê xebatê. Ez bî xwe ji malbateke proleter têm. Bayê min karker bû, diya min paqîsi dikir. Rebenan nezan bûn. Lema salên pêşin lî dibistanê ji bo min pir dijwar derbasbûn. Wê çaxê, hingê ez zarok bûm, lê min fahm dikir ku kêmasyek, çewtiyek heye dî jiyana cîvaki da. Lê çi bû ev kêmasi yan ji nerasti? Pişti çend salan paşê ez têghiştüm ku çina karkeran xwediyê kultureke serbi-xwe ye. Û pêwiste wîsa be. Mîxabin ku gelek caran zehmetkêş ve yekê nîzanın, ji ber ku bî xwe nezanın û dî binê bandora kultura



foto: Elly Berg

çina serdest da dîminin. Min dî ji-yana xwe da ev rasti ditiye û ez gelek caran pê êşiyame.

Bîndest û zehmetkêş dîvê bî xwe kultura xwe biafrinin, lê xwe-di derkevin û wê pêşda bibin. Dî vi wari da ji ronakbiran ra gelek wezife dikeve.

Dî salên şêstan û hefteyan da, dî nav civaniya swêdi da rûmeta sosyalizmê bilind bû. Dî xwendegehêن bilind da entelektuelan bî zimaneki bilind propaganda azadiyê û wekheviyê dikirin. Lê bî rasti ez ji komunistên-akademik yên swêdi tu tişteki hin nebûm. Min zimanê Malcolm X û Franz Fanon baştir fehm dikir. Ez ji şerê Cezairê û ji pirtûkên Franz Fanon gelek tiştan fêrbûm. Lî diji zordestan û kolanyalistan ez tim lî aliyê gelên bîndest bûm.

Dema iro ez dî nav zarokên karkeran da dixebitim, ez zarokên mihaciran ji dî nav zarokên karkeran da dijmêrim û ev xebat ji ji bo min xebateke siyasi-çandi yê.

**ROJA NÛ:** Zarokên biyanîyan, wextê ku têne nav civata Swêd, rasti çi dijwari û hevrîkiyên çandi (kulturi) têن lî gor ditina te?

G.LUNDGREN : Ez baweriya xwe bî diyalektikê tinim. Guherandin her tim heye. Mesela mihaciriyyê iro li cihanê meseleke giringe. Bêşik welat guhartin, û mihaciri bî daxwaza insanan nabe. Dijwariyên mihaciriyyê hene. Lê dîvê mirrov pîr tari ji nebine vê guhrandinê. Aliyên baş ji hene dî nav da.

ROJA NÛ : Mesela wek çî?

G.LUNDGREN : Em bêjin ji we laten paştamayı, ji civatên feodal û niv-feodal insan têne Swêd. Zor destiya lî ser jinan dî nav vê civatê da, bixwazi nexwazi tê şikan din. Anglo ez nîkarım bêjim ku malbatêni mihaciran û zarokên wan ji bini va ji jiyana xwe ne razi ne. Dijwariyên ku hene ji, zêdetir ji bo mezinan in, zarok zûtir adapteyi civata nû dibin.

Ew dijwariyên ku hene ji, dîvê sedemê wan bî awaki vekiri bêni nişandan. Hem ji bo zarokên mihaciran hem ji ji bo swêdiyan û zarokên swêdiyan..

ROJA NÛ : Tu dî nav zarokên kurdan da ji xebiti. Rewşa wan çawa ye? û dijwariyên wan çime?

G.LUNDGREN : Bala min kişand weki zarokên kurd yên ku ji malbatêni siyasi têni, zêdetir bî xwe bawer in û şexsiyeta xwe baş dîparêzin. Dema ez dîpeyivim, ew min baş fehm dîkin. Zarokên kurd ji min gelek razine, ji ber ku ez lî ser meselên siyasi ji dîpeyivim. (esasen ev yek qedexe ye lî dîbistanê). Ez lî taxa Rinkeby û Flemingsberg bî zarokên kurd ra dixebeitum. Zarokên kurd lî Rinkeby zêdetir lî şexsiyeta xwe

xwedi derdikevin. Çima ku dê û bavêni wan siyasi ne. Mesela lî taxa Flemingsberg kurd hene lê zarokên wan bî tîrki dîxwinin û lî kurd bûna xwe xwedi dernakevin. Carna ez dîpîrsim, "kes ji we kurdi dîzane?" Wê çaxê yên ku kurdin çavêni xwe çar vedîkin û bî meraq lî min dînhêrin. Lê na xwazin eşkere bikin ku kurdin.

ROJA NÛ : Tu bî xwe sedemê vê yekê dîzani çiye?

G.LUNDGREN : Erê, niha ez dîzanim. Lê ji vir deh sal berê min bî zarokên tîrkan va tevayî filmek çêkir bî navê "Merhaba". Wê çaxê min nîzanibû ku dî nav wan da zarokên kurd ji hene. Ez pîr dereng pê hesiyam. Lî dîbistanan, iro ji pîraniya mamostayêni swêdi pê nîzanin ku zarok hene, lî mala xwe bî kurdi dîpeyivim û lî dîbistanê ji bî tîrki û swêdi dîxwinin. Mamostayêni tîrki ji hêç behs nakin. Ez nîzanin, gelo dî nav tîrkan da mamostayêni pêşverû kêmîn, yan...? Nîzanim.

Lê zanina swêdiyan derbari kurdan roj bî roj pêşda dice. Ev grêdayi we kurdêni şiyare. Dîvê hûn bixebeitin, xwe û dijwariyên xwe bîdin nasin.


Mesela roja 12-2-1985 dî şahiya da, bî saya Berna' ye gelek guhdaran bîhistin û ditin ku kurd hene û bindestin lî welatê xwe.

ROJA NÛ : Sîpas ji bo bersivêne te.

G.LUNDGREN : Sîpas, ez ji pîr dilxweş bûm, dî kovara xwe da cih bîdîne helbesta Berna'yê ji!

DI RADYO Ú ROJNAMEYÊN  
SWÊD DA

KEÇEKE  
KURD



*Ez keçeke kurd im  
Jî Kurdistanâ Turkiyê  
Li Turkiyê rewşa kurdan xerabe  
Mirov nikare kurdî bîpeyve, qedexeye  
Dema mirov bîpeyve tê kuştin*

*Li dibistanê em mecbûr in bî turki bîpeyvin  
Em diroka turkan hindibin  
Weki baştûrin turk in li hemû cihanê  
Govendên me ji aliyê turkan va tê leyistin  
Ü li me qedexe kirine ku em stranê xwe bistirên.  
Her roj gelê min tê kuştin  
Li ber çavên zarokên piçük  
Bavê wan tê kuştin*

*Ez hevalan dixwazim  
Ez hevkariyê dixwazim  
Bî hemû zarokên cihanê ra  
Aşityiyê dixwazim li hemû welatan  
Ü welateki xweş ji bo jiyinê.*

Dî meha sebatê da, keçeke kurd dî radiyo, rojnameyêن Swêdi da, dî şahiya zarokan da, bî hevpeyvinan, bî helbest û sitranêن xwe, dengê zaro-kêن Kurdistanê gêhande sedhezaran guhdar û xwendevanêن Swêdi. Berna ye navê wê, sêzdeh sali, muzisiyeneke jêhati û bî huner...

Li Stockholmê, projek bî navê "Rädda Barnen" (Zarokan Rîzgarkin) lî taxên mîhaciran, dî nav zarokêن bîyaniyan da lêkolin û xebat pêkanin. Nîvîskar û pedagog Gunilla LUNDGREN ku dî vê projê da dîxebîte, jî nê-zik va bî Berna'yê va elqeder bû. Dî şahiya zarokan da ku dî roja duwazdê Sebat da ji aliyê "Rädda Barnen" hatîbû amadekirin, Bernayê bî sitran û muzika kurdi gelek sempati girt. Li ser vê yekê radiyoya swêdi ya dewle-tê û rojnameyan ji bî Berna'yê ra hevpeyvin çêkîrin û cih dane stran û helbestêن wê. Radiyoyê dî programa xwe da niv saet û rojnama "Aftonbladet" bî hevpeyvineke dirêj cih dane Berna'yê. Helbesteke Bernayê lî gel helbestêن zarokêن mîhaciran (Dî nav wan da helbesta keçeke kurd bî navê Berfin Baksi ji hebû) dî rojnama "Dagens Nyheter" da hate weşandîn.

Rojnamevana "Aftonbladet" Malou Von Sivers, dî nîvisara xwe da li ser pîrs û dijwariyêن zarokêن bîyaniyan radiweste. Ew, wek nîmûne Berna'yê pêşandide û li ser serpêhatiyêن wê û malbata wê jê dîpirse. Berna, bî bersi-vên bî aqîl, serpêhatiya xwe û malbata xwe û rewşa kurdan lî Turkiyê tinê ziman.

## ZOZANÊN ME HEBÛN

Zozanêن me hebûn lı serê çiyan  
Çıqas xwaziya mın tê, jı wanan  
Ne hebû cihê me lı erd, ne lı ezmanan  
Lê disa ji xweş bû jiyin lı zozanan  
Dilistin stêrkên ezmanêن şin, bı hevra  
Zikeki meyi têr, yeki birçi hebû  
Lı ser şiva ma pari nanê genmê sor  
Ü tase ava sar  
Çend pivazên hêşin û mastê miyan hebû,  
Hebû-tunebû, disa ji hedûra me hebû  
Dema tari dikete erdê,  
Çadırêن sıpi dîbûn çirayêن zozanan.  
Aliki dengê şivanan, gûran-gurêxan  
Ü aliki dengêbêrivana tevhev dîbû lı zozanan  
Jı aliki da banz dîda berxan, karan  
Hev dîgevizi se kuçık  
Ü hev şû dîbûn kudikêن dêlikan  
Ü dilanan dajot,dîçû, lı van şevêن zozanan  
Carke dîm ro derdiket, jı mała xwedê  
Sibe lı me ron dîbû  
Sor dîbû,zer dîbû û bilind dîbû.  
Derdiketin jı malan  
Zeri, domam û xatûnêن malbavanan  
Xwe davitîn jı kendal û geliyêن kûr da  
Dîçûn serşoyê, kirasşoyê û dîçûne beravê  
Lîngêن wan nedîbû, jı newalan, çeman  
Newal jı xwe ra kirbûne mal-xani wanan  
Ezmanê şin dîgirte ser gelîyan, wek serbanan.  
Dibêji xalo disa bahar hatiye lı welatê mın Kurdistanê  
Jı mın ra hîne sıping, tırşo û deste kulilkêن beravan bine  
Çı temêن hêşnayê hene, berev bîke bine apo  
Ser te bigerin polêsêni Tîrkan  
Bêje,bıraki mın heye bedhale, dînale  
Ev dermane  
Jı welatê xwe dûr ketiye ev çend sale  
Rebeno, merûmo, ew tengezare  
Ne male, ne hale  
Jı ber mîn, here herdu suretêن diya mîn  
herdu gupikêن suretê wê  
Suretên gul-guli  
Dêmêن sorgulu ramûse apo  
Wê ez mezîn kîrim  
Revandîm ez, jı sur-sermê  
Paşla wê da mezîn bûm ez

Ez diketim xewê  
Paşê, diya min, wek teyran ez firandim  
Û filitim, qetand min benden xwe  
Min hat dani Frankfurtê cara pêşin  
Frankfurta xopan, kavil û wêran,  
Tenê têda bilind dibûn avahiyên bankan  
Şirketan û dengê jinên xwe difrotin bî peran.  
Nizam: niha lî kuye diya min  
Diya min çavêşıya bavê min, bavê min gula suretê diya min  
Çend bahar hatine, çend bahar çûne  
Çend sal hatine, buhurine apo  
Îro dema ez lê dînhêrim  
Ez aliki ketûma, welat aliki, çavêñ min rê dîkşinîn  
Û herdu çavêñ min lî rêda mane.  
Ez din kirim vê şeva baharê  
Gava welat dîkete bira min  
Nan gewriya min da ne dîçû xarê  
Û ne dîçê gundê me, lî ber serê min  
Lî vê şeva baharê.  
Bîfikire keçka delal, tu dîxwazi heri welatê xwe  
Heri mala xwe  
Lî bal pîzmam, nas û dîlketiyê xwe  
Tu mîze diki, riya te dîbirin  
Te dîgrin, lî ser te dîgerin  
Û te dibin davêjin nav çar diwarêñ tari  
Û çi hate serê te, tu ji nîzani.  
Eve, çirok û serpêhatiya me kurdan.  
Bawer bike, kafirê dîjmin  
Tu wext nehiştiyê çavê xwe veke ev gelê xîzan  
Bê bexti û xayintiya mezîn ditiyê gelê me.  
birine ser avê, av nedanê bî salan  
Te dîgot rojekê ez birçi mam  
Keseki nan dîrêji min nekir, aveke sar neda min  
Lê bawer bike  
Ev gelê xîzan , hezar sali birçiye.  
Ey keçka xortxapanok û keçka dîlovan  
Ez zanîm dîlê te, dîleki dine  
Bawer bike, ji bo mîrovêñ me  
Dînya çawa tu dîfikiri, ewqas xweş  
Û fireh nine,  
Te bî çawen xwe va dit, ew keçka mîzar kevn.  
Ew keçka, qiza gavanê me  
Hertim, êvar-êvar, deri-deri dîgere  
Ji bo nanê gavantiyêberev bike, ji bo birçi nemine  
Ew, dî vê dînya xweş da, xweşiyê dîgere  
Û nabine  
Eve serpêhatiya me kurdan.

# KOVARA «JİN»

Kovara "Jin" ya ku di navbera salêن 1918 - 1919'an da li Stenbolê hatiyê çapkırın, ji nû va hate weşandin. Çawa tê zanin ev kovara, bî kurdi û turki hatiyê çapkırın û 25 hejmarêن wê derketine. Niviskarê kurd M.E.Bozarslan paşı xebateke dûr û dirêj, ev efrandina diroki, carke din, ji nû va gihande destê xwendevanan. Dî vi cildê pêşin da 5 hejmarêن kovarê hatine berevkirin, cil-dên din ji, wê dor bî dor bêne weşandin.

Jî bo ronahikirina rojêن buhuri û ve-jandina diroka kurdî, ji bo hinbûn'a rewşa wan salan, rewşa diroki, civaki û çandı, bî rasti gelek tiştên hinbûnê, di nav rûpelêن wê da cih girtine. Jî aliyê din, ji nû va derketina kovara "Jin"ê, ji bo hinbûn û zanina diroka weşanêن kurdî yêن periyodik ji gelek gaveke hêjaye.

M.E.Bozarslan tenê orjinalêن kovarê çap nekirine, bî tevi orjinalêن bî tipêن erebi, wusan ji, latiniya orjinalan bî kurdî û turki ya wan, bî hevra daye weşandin. Jî der kovarê M.E.Bozarslan, bî kurdî û turki wek pêşgotin an ji despêk du nivisarêن dirêj ji, dî vi cildê pêşin da çap kiriye. Niviskar bir û baweriyêن xwe, ramanêن xwe di van herdu nivisaran da şirovedike, wek:

- 1 - Haydariyêن Gîsti Dî heqê Kovara "Jin"da
- 2 - İdolojiya Kovara Jin
- 3 - Bergehê Jin'ê yêن Siyasi
- 4 - Ronikirina Bûyerêن Mêjin
- 5 - Bûyerêن Rojin û Cîvaki
- 6 - Xebata Çandeyi û Bêjeyi
- 7 - Çiroka Vejandina Kovara "Jin"
- 8 - Nasindina Çapa Nû

## JÎN

KOVARA KURDÎ-TIRKÎ \* KÜRDÇE-TÜRKÇE DERGİ  
1918-1919

Cild I

Wergér  
ji tipêن Erebî  
bo tipên Latînî:

Arap harflerinden  
Latin harflerine  
çeviren:

M. EMÎN BOZARSLAN

Kovara "Jin", me li jor ji got di sala 1918'an da derketiye û çawa M.E.Bozarslan diyar dîke weki ev weşana organa neresmi ya "Komela Pêşketina Kurdistanê" bûye.

Bî derketina kovara "Jin" va, bî rasti efrandineke gelek hêja gihişte destê xwendevanêن kurd. Lî ser rewşa Kurdistanê, di despêka sedsaliya 20'an bûyerêن giring, li Kurdistanê, pêşketina civata me, di wê dewrê da, kar û xebatêن ronakbir, zane, hunermend niviskarêن kurd, tekoşina gel, xwendekar, jin û karkeran, bî kurti kovara "Jin" wek pencerekê, an ji wek neynikekê van salêن buhuri tinê ber çavêن me û bala me dikşine ser van rojêن buhuri. Xwendevan, bî saya kovara jin dikarm bibinin, weki civata kurd paşı derketina kovara "Jin" di navbera van 65 salan da çawa hatiyê guhrandin, guhartin çine û pêşketin û röhildanêن (mesafe) çawa pêk hatine, xwendevan dikarin bî vi tehri navbera DUH İRO Ü SIBÊ da pêwendî, bend û pevgirêdanêن xurt bibinin.

# dengbêj Kerem

Berevkar: M.Ararat

Lî ser jiyan, dengbêjti û şairdiya Kerem, hewceye meriv kareki kûr û dirêj pêk bine. Bî kurtasi, Kerem li gundê Aşê Kera, dî nabêna Bazid û Wanê, jî diya xwe bûye.

Piçûktiya wi li ber destê dengbêjan da derbaz bûye. Wexta wi, klamên xwe strane wi ji jî wan ra qend û şerbet çê kiriye û pera ji hunera dengbêjtiyê hinbûyê. Hê dî xortaniya xwe da bûye dengbêjeki bî nav û deng.. û lî pir hêlên welatê me, dî nav cimaetan da straye.

Kerem piraniyêن kîlamêن xwe li ser serhildanê Kurda, mîrxasi, evini û li ser welatê me yê delal dinexişne. Ew, rex dengbêjtiya xwe, gîhiştiye merteba şairtiyê ji. Weke kîlaman, helbestêن xwe ji bî devki (ezbere) dixwine. Kerem jiyanâ Kurda ya cîvaki da nexşen edebi radixe ber çavan, feylosofiya gel tîne ziman bî goreyi wê, li merivan şiretan ji dîke.

Ev serhatiya, Kerem û mirina axê, qewimandineke rast e. Ehmed beg, axê gun-dê Xaça û xwedanê piraniyên merg û zeviyan bû. Lê tenê neh-deh malêni wi gun-di berxwe didan, ku axa erdê wan zevt neke. Ehmed axa ji dikir wan bî tîrs û zorê ji gund derxe û erdê wan ji xwe ra zevt ke. Rojekê lê dixe rûspiyê wan malan, Keko, dikuje. Bîrayê Keko, Xosrof ji tev pîsmamêni xwe va diciñe ber mala axê û gulleki berdîdinê, dikujin. Demekê şunda jîna axê cawê diciñe ser Kerem, ku were kilamekê bavêje ser axê.

Îro lawikê min siware, siwarê bozeki tere  
Mertala li ser milê wi xaq û pere  
Boz dî bim da gilovere  
Yeqin bikin ser talana şere  
Wusa bîke pêşî li ser paşiyê vegere  
Ramusaneke ji min bistine, bila li canê te bîhele  
Tu li kuda dici yek seriya li min vegere  
Ew herdu memikêni mina sêvîn payizê  
Serê dara bimine hê tere  
Malê me danine gundê vi quntari  
Xwaginçi li mala bavê min rûniştî  
Qelendê min digot, xelatê min dibiri  
Xîzêma pozê min mina çerxa felekê li hev dizviri  
lawikê min bona ramûsanakê  
Hate ser singê zeriyê, şir tune bû, disa para ziviri.

# NEWROZ-1985



Newroz - 85 , Şeva KOMKAR li Diusburgê

Cejna Newrozê, isal ji bî awaki gîrsî hate pirozkîrin. Lî dervayî welat ,xazma li Elmanya Rojava bî hezaran insanê me li hev civiyan û cejna Newrozê piroz kîrin.

Lî Elmanya Rojava, Federasyona Komelêن Karkerêن Kurdistan (KOMKAR) li çar bajarên mezîn, şahiyêن pirozkîrîna Newrozê amade kîr. Dî van şahîyan da nêziki 13 hezar kes besdar bûn. Lî Diusburg'ê 6000, li Berlin'ê 1600, li Munih'ê 2000 û li Hamburg'ê 2500 zehmetkêş û welatparêzênen Kurdistani dî şevênen KOMKAR'ê da deng û dî dilênen xwe kîrin yek.

Bernama van her çar şahiyênen KOMKAR'ê ji hev dewlemendtir û tekûztır bûn. Bernama van şevan bî sırunda "Kurdistan" vedibû. Paşê dor bî dor komêñ govendê, hunermeden musikê û sitranêñ gelêri hatin pêşkêş kîrin. Komêñ govendê, ji dorhêla Diyarbekir, Wan, Adiyeman, Eleziz û Entabê govendêñ kurdi pêşkêş kîrin. Hozan Şivan, Gulistan, Feqiyê Teyra, Kemal, Delal, Şêxo û her wusa komeke sitranan bî zazaki kîlam û sitranêñ me gotin. Dema bî wêneyê dia seydayê Cegerxwin hate nişandan, û silavnama sekreterê giştî yê Partiya Sosyalist a Kurdistanê Tirkîyê (PSKT) Kemal BURKAY dihate xwendin tezahurat û siloganan salon tije dikir. Dî bernameyan da komeke muzikê ji Partiya Komunist a Elman(DKP) ji cih dîgirt.

Televizyona Elman dî 21'Sîbatê da cih da şahiyênen Newrozê û ji şevênen KOMKAR çend ditem nişanda. Televizyonê bî çend guhdarêñ kurd û elmanan ra û bî serokê giştî yê KOMKAR'ê ra hevpeyvin çêkir û weşand.

Şahiyêن cejna Newrozê ,ku ji aliyê KOMKAR da hatin amadekirin bî çanda gelê me û bî giyanê(ruhê) têkoşeri hatibûn hûnandin.Çawa tê zanin, xebatkar û xwendekarên kurd li Elmanya Rojava, her sal bî hezaran têne şevê KOMKAR'ê û dî van şevan da , daxwaz û hêviya xwe,çand û hunera xwe dibinin.Ew di van şevan da,carekê disa hêrs û rika xwe li diji zordestiya kolonyalistan, li diji faşizmê,zulmê û newekheviyê bilind dikin. Hejmara beşdarêن cejna Newrozê sal bî sal zêde dibe.Ev ji nişaneke ji bo xwediderketina gelê me li Newrozê û xebata KOMKAR'ê .



Newroz - 85, Seva KOMKAR li Hamburg'ê

#### LI WELATÊN DIN

Lî gelek welatên din ji,şoreşger û welatparêzin Kurdistanê cejna Newrozê piroz kîrin.Lî Firansayê Komela Karkerên Kurdistan Lî Fransayê, li Hollandayê Komela Yekitiya Karkerên Kurdistan, bî destegiya komên çandi yên KOMKAR'ê şevê pirozbahiyyê amade kîrin.Lî Hollandayê 800, li Fransayê ji ji 800 kesi zêdetir di şevê Newrozê da beşdarbûn.

Lî Swêdê Federasyona Komelên Kurdistan, li Danimarkayê Yekitiya Karkeran li Avustraliya Komela Kurdêن Avustraliya, li Norveçê Komela Karkerên Kurdistanê ya Demokratik berpisiyariya pirozkırına Newroze hildan ser milê xwe. Xêن ji van welatan li Ingilistanê, li Avusturya û çend welatên din ji Newroz hate pirozkırın.

# FATÊ

DİLAN

Xaltiya Zerê kijan salê û kijan rojê hatiye dinê pê nizane. Jî xwe lî wela tê me ev adet berê tune bû û niha ji lî gundan tune ye. Roja bûyina zarokan dî wextê da nayê nivê sandım û dî bira kesi da namine. Gava dê û bav behsa emrê zarokên xwe dikin, dibêjin, "filan dî zivistanê da hate dinê, berfeke mezin hati bû..." yan ji "em lî ber cehan bûn...."

Gora ku Xaltiya Zerê behs dîke ew niha şest û pênc sali derbas bûye. Dibêje, dema serhildana Şêx da ez neh-deh sali bûm....

Xaltiya Zerê, xuyaye êdi pir e. Lî welatê me jîn gelek zaro tinin, gelek eza û cefa dikşinin û zû pir dibin. Wê ji heyşt zaro anine dinê, nêvi hin di piçûktiyê de çûne, nêvi mezin bûne.

Niha kureki wê dî hepsê da ye. Cezayek gelek dîrêj dane wi. Kurê wê lî zaninehê xwendevan bû, toxtori dixwend. Wi ne kesek kuştı bû, ne ji dizi kırı bû. Ew welatparêz bû. Bo rizgariya gel û welatê xwe kete rêxistineke welatparêz û tê da karkır. Cûrmê wi ew bû.

Xaltiya Zerê, bona vê yekê, bu piriya xwe nasekine, lî otoboz û trênan suwar dibe, zû zû diçe kurê xwe bibine. Kurê wê lî zindana bajareki dûr e.

Xaltiya Zerê pir e, lê disa hisyar û jir e. Kar dîke weki ciyê kurê xwe wala nehêle. Hemû xortê şoreşger û welatparêz wek zarokên xwe dibine. Lî halê wan dipirse, xwarin dide wan, jî wan ra gore û fanile çêdike.

Wê rojê wexta min ew dit, serê xwe danibû nav herdu destêن xwe, ketibû nav xem û xeyelan. Nêzi wê bûm:

- Xêre Xalti Disa ji tişteki acız bûyi?
- Çawa acız nebim, got, Ax Fatê tu dî erdê kevi!
- Kijan Fat?
- Fata xwişka min..
- Çima wê çi kiriye?

- Ez çûbûm ditina kurê xwe. Niha Reşit dane zindana Sinobê. Kelahek kevn e, ber behrê da. Dibêjin girti dî bin erdê da zindanê kûr da diminin ku ro pê nakeve. Tim şîl û tariye. Lê ewqas rê çûm, westiyam û mesrefa dinê kir, kurê xwe ji nedît. Ditina wan disa qedexe kîrine. Jî riya cil û çar seetan destwala vejerim hatim. Bona mesrefa rê min radyoya malê firotibû. Lê disa ji ez ber wê nakevîm, ber kurê Fatê dikevîm. Kurê Fatê bûye Türkêşçi.... Lî garajê rasti kurapê xwe Xelil hatim. Kurê wi ji girtiye. Wi ji min ra got ku, kurê Fata me bûyê Türkêşçi. Ez ber wê dikevîm. Weki kerek xîstîn lî cigera min. Ax Fatê Fatê, porkurê Fatê! Te zarokên xwe çawa mezin kîrin? Ma te qe tiştek ji wan ra negot? Te qet behsa wan rojêñ rês û zulma Roma Reş nekîr? Te negot: min çawa tu ji ber devê têyr û tûran xîlaskiri?

- Çawa Xaltiya Zerê?

Ü Zerê destpêkîr, çiroka xwe û ya Fatê ji min ra got. Wê çawa ji min ra gotiye, ez ji yek bî yek neqlî dikim. Ne zêde, ne kêm. Çirok usa ye:

Em xelkê Paloyê bûn. Navê gundê me Ardûrek e. Ardurek gundeki hêşin e, bî dar û bere. Lî dor zeviyan û ber avan dor bî dor spindar dîrêj dibûn. Darê guzan û tuyan lî hev dîqelîbin.

Jî bin gund çemê Muradê derbaz dîbe. Çemeki xurt e, tê da masi pîrin. Lî wi ali Muradê Ekrek heye. Herdu gund himber hev in. Em bî kelekê dîçûn û dihatin.

Dema serhildana Şêx ez neh-deh sali bûm. Porê min dîrêj bû, dîghişt serçokê min. Dapira min ew şedikirin. Bî rengê hunguv bûn.

Lî gundê me, jê ra Xalo digotin merivek hebû. Gundiyân gelek jê hez dîkir. Meriveki jir û mîrxas bû. tîm diji zûlm û zordestiya axa û began derdiket. Bona vê yekê pircaran ji wan teda dîdit û lêdixistin. Nedîçû mîzgef-tê û nimêj ne dikir; disa ji gundiyan gelek jê hez dikirin.

Apê Xalo pircaran dîçû nêçirê û ez ji bî xwe ra dîbirim. Tîfinga xwe dîda ser milê min û usa nişan dîgirt. Bona vê yekê porê min, dî herdu ali da li ber guhê min, piçek şewiti bû.

Rojekê sîpi ketin porê min, tije bûn. Dapira min xwest porê min jêke. Ez revim çûm mala Apê Xalo Jîna wi ji nexwest porê min paqîjke. Apê Xalo bî destê min girt; ez birim ber tavê. Serê min da ser juniyê xwe, hûr hûr lê nhîeri û sîpi yek bî yek paqîj kîrin. Serê min bî qazê mistda û porê min xilaskir.

Jî ser wê qasi panzdeh roj derbaz bûn. Rojekê Apê Xalo lî hespeki su-warbûyi û tîfinga wi lî pişt da kete gund. Got:

- Leşkerê Etatîrk ketine Ekregê, gundi qîrdîkin. Zûbin, nesekînin, emê derkevin çiyê!

Gundi bî tîrs û xof, bî lez û bez kombûn. Pîr neçû me xwe da riya çiyê Hinan çêlekên xwe dabûn pêş xwe û zarokên şirmij dî humbêza diya xwe da bûn. Dî nivê rê da Xalo sekini û vege ri wan got:

- Ho hoo... Dengê zarokan û dengê çêlekan! Leşkeren Misto wê bî me bîhesin û koka me binin... Dîvî hemû kes çêlekên xwe û zarokên piçûk lî vir bîhêle, usa derkeve çiyê!

Wext kêm bû. Kesi dengê xwe nekir. Jinan bî dîlşewat û giri pitikên xwe lî dor rê, nav keleman da veşartin, çêlek bî şunda hîştin û bî rîketin. Bo ku zarokên xwe yên dinê xilaskin ji wanra çareyek din tune bû. Diya min ji xwişka min Fatê bî şunda hîşt. Hîngê Fatê deh roj bû.

Xelk bî pêş va çû. Lê dîlê min diyax nekir. Gunehê min bî xwişka min a piçûk dahat. Ez bî dîzi şunda vege ri yam, min qundaxa Fatê humbêz kir û ji dûr va bî dû wan ketim. Jî nav zinar û daristanan derbazbûn derketin jori çiyê. Min piçek wê da, nav keleman da fatê dani û çûm cem wan. Kes pê nehesiya.

Qasi niv seet şunda, merivê ku bo novedari me lı dor gund hıştibû, derket hat. Xeber da ku leşker ketiye gund, pez û dewar kuştiye û ber bı ciyê tê. Xalo dûrbîn girt û çû ser zinareki. Hemû mér û hin ji jin, tifingên wan bı dest da, çarmedor ketin sengerê lı benda wan sekîn. Piçukan ra gotin, "xwe baş veşerin tucar dengê xwe nekin!"



Pir ne bori, leşkeran ji jêr va, wek gûrên birçi û har xuyakîrin. Lı gelî û zinaran geriyan. Carcaran dengê tifingan sixlet dibû. Xuya bû, dehl û deviyêñ ku ew tê da diketin şikê, didan ber agir. Jı kesi deng dernediket. Te di go kêr lêkeve xwin ji kesi naçe. Xalo emîr dabû, heyâ ew işaretê nedî divê kes tifingê bernede.

Dengê leşkera nêzik bûn. Ew belki neh-deh gav nêzi ciyê me hatin, lê tiştek ne ditin, dûrketin çûn.

Panzdeh-bist deqe derbaz bûn. Xalo bı dûrbina xwe vegeri . Got, "Çavê me roni be! Leşker ber bı jêr kişiya."

Herkesi bîhneke fireh girt. Zaro û jin ji ciyê xwe derketin. Mêran cixarêñ xwe vêxistin. Dî wê demê da nişkava dengê zaroke piçük hat. Qije, qija wê bû. Min bazda ku xwe bigihinim Fatê. lê ez çawa gihiştümê, bı silpaxekê lı erdê dîrêj bûm. Ew Apê Xalo bû lı min xist. Ez rabûm birevîm, silpaxa dînê ji ji diya min hat. Dîgot: "Porkurê , te mala me bîşewitanda!"

Dev û dîranê min dî nav xwinê da mabû. Lê min fêmdikir ku tişteki gelek xerab kiriye.

Apê xalo, kêra xwe derwîst, hema lı wir guliyêñ min ê delal ji bini va bîri, serê min rût kîr. Pişti çû, ji me dûr bin zinareki da qasi seetekê tek te-nê rûnişt. Wexta vegeriya çavêñ wi sor bûn. Ez bı ber porê xwe neketim lê gelek ber xwe ketim ku min Apê Xalo ewqas êşandi bû.

Pişti du rojan em ji ciyê daketin jêr. Hin mér disa lı wê man. Lı rê em lı zarokêñ piçük geriyan. Lê ji xwin û pirtalêñ wan zêtir me tiştek ne dit. Guran ew xwarîbûn. Lı dor gundê me, lı wan ciyan gur gelek bûn.

Xaltiya Zerê çiroka xwe xîlas kîr û got:

- Keça minê, ew Fat, ev Fat e. Ez dîqehrîm ku çawa kurê wê dîbe Tîr-kêşci. Xwezi guran wê ji bîxwara...

# Saliya Ferikê USIF



TIMÛRÊ XELİL

Bı rasti gava em lı ser miroveki navdar da dînîvisin, dîxwazin her tenê destanînêni wi bîdîne diyarkîrin û ser kîmasiyân zêde nesekînin. Lê niha, gava ez wê gotarê dînîvisim, zanîm ku bawêr bîki kîmasiyêni wi tunene. Hela serda, ez dikarîm bêjîm, ku Ferikê Usif beri her tîstî miroveki qenç û şîrhele. Paşê helbestvaneki mezine, dî nav helbestvanêni Kurdêñ Sovyet da.

Belki navê wi pîr belav nebûye, ew ji, ji miluktiya wi tê, ew hez nake, gava ew propaganda dîkîn, besnê wi dîdîm. Ewi nîvisara helbesta ji xwe ra kîriye deyn, gava helbestêni wi dîxwini, nikari zû jê bîqeti û goti ci-cina çend cara lê vegeri, ku naveroka helbestêni wi baş tê bîghêji û dersê jê bigri.

Jêhatibûna wi lı ser tebiyetê, kurdiya xweş, zanebûna zîmin, hajpêhe-bûna folklorê, sadetiya wiya delal û welatparêzi, rewşa giyanê (ruhê) Ferikê Usîfîn. Eger em bî du-sê gotina bêjin, ew ji gelê xwe hîldide û dîde gelê xwe.

Ferikê Usif salêni dîrêj bî hozan û nîviskarêni kurd yêni navdar Şîkoyê Hesen, Emerikê Serdar, Qacaxê Mîrad, Mîkayîlê Rêşid, bî serokvaniya Xelîlê Çaçan Muradov dî radiyoya kurdi da xebitiye, wi piyeseke delal bî navê "Qelen" nîvisiye û kîriye şano,

Bî xwe ji rejisi lê kîriye û dîlqeki sereke da dîlize. Bili wê, ew ezberbê-jeki jêhatîye, gelek caran şahi û civinan dahelbestêni xwe yêni nuh dîxwine.

Beri çendeki lı quesra mala nîviskarêni Ermenistanê da bû êvariya şayneti, kû pêşkêşî 50 saliya bûyina wi kırıbu.

Sekreterê serwêrtiya yekitiya Nîviskarêni Ermenistanê M.Sargsyan êvari vekir. Lı ser jiyina wi, karê wi, nîviskar Babayê Keleş raporeke kûrfikir û bî sercem xwend. Dî vê civinê de gelek nêvan besdar bûn wek, Prof.Heciyê Cndi, Seroka beşa nîviskarêni kurd Karlane Çaçan, serwêrê beşa kurdzani-yê Şekroyê Xado, dewsgürtiyê dekanê fakulteta filologiyê Kinyaz İbrahim, serokê dîbistana gundê Sipanê Temurê Mirzo, helbestvan Çerkezê Reş...

Paşê Ferikê Usif deng kîr û razibûna xwe diyari mîvanan kîr. Dî beşan dudan da, helbetêni Ferikê Usif hatin xwendin, koma listikêni gundê Camuşvanê, sazbend û dengbêjên kurd paşê tevi programa êvarê bûn.

---


## DENGBÊJEKİ ÇIYAYÊ KURMÊNC

---

Lı gor zanina me, eva cara yekemine ev strana tê nivisandım. Dengbêjê jêhati Ali Heyder jı Çiyayê Kurmênc , jı navça Efrinê ye. Wi em û hezkiriyên folklorâ kurdi dewlemend û kêfxweş kiriye. Heya niha vi dîlsozê kurd şes kasêt jı bo me tiji kırine û dengê xwe yê şirin va gelek klaman jı me ra distirê. Niha em lı jêr nimuneyekê jı stranêni wi pêşkeşi xwendevanan dîkin û em hêvidarın kû, hunê berhemêni vi hunermendê kurd dî demeke nêzik da, dî nav destêni xwe de bîbinin.

Dr. Retiber Rêzan

Dayê dîlê mîni dîne  
Jî kula ra bî kule  
Jî bîrindara ra bî bîrine  
Derdê eşqê girane  
Derdeki bê dermane  
Xwediyo! tu bî serê tu kesi qî nebîne  
Ku lî navbera du dilan, gotineke neçê bîke  
Û herdu dilan jî hev bî dûrxine.  
Bila birûska esmana, qurşina heft dîrami  
Lî bini çêng xine  
Bila bîrina xwe kûr be, kula xwe xedâr be  
Sîbê heyâ êvarê dest lî ber navê be  
Qêrin û holina xwe ber ezman be  
Îskirina iski, xwin be  
Bila ilac û dermanê wi qoçê deva û şirê çivikan be  
Em ji qe nayne dîne  
Bila perçê dîl dî kezebê û dêv ra bîweşine  
Heft sala dî mala xwe da nin û arvêñ qe nebîne  
Bila nan bî kêrgi be, ew bî xwe taji be, para qe neghine  
xwe nede darê bêşka û derguşa, nebêje  
De nenî, nenî  
Bila mîza zarokêñ nêr û mî jî dayê xwe qe nebîne  
Xwediyo! Ela! bila mezînêñ xwe lî mezal bin,  
Piçûkêd xwe fex lî ser bin  
Xortêd xwe çav kor bin  
Pirêd xwe rûreş bin  
Nan bî jetire bê, dew bî qehwê bê  
Bila lî devi gelî, newala serseri bî keçêd wan şabin  
Zîk tijibin, hemêz vala bin  
De here law, law, xortê min lêdûrê min...



## Victor HUGO

İsal dı ser mirına hozan û niviskarê fransi Victor HUGO ra sed (100) sal derbaz bû.Bı sedemê ser sala mirına niviskarê romana "Bellengazan" isal lı çaralı cihanê dı kovarên çandi û edebi cih dane Hugo ,şexsiyeta wi ya edebi û efrandinêni wi.Nav û eserên Hugo piştı 100 salan hê jindar û bı rûmet in.Çimki jı aliyê huneri da efrandinêni wi hêjabûna xwe iro ji dîparêzin, ev yek, ya duwem ji babetê roman,serpêhati û tiyatroyêni wi iro ji lı mederê hene.Çawa tê zanin wi hunera xwe jı bona avakırına jiyaneke çêtir pêşkêşi şerê zehmetkêşan kır.

Victor Hugo,dı xortaniya xwe da-hingê hijdeh sali bû—dest bı xebatêni edebi kır. Dı demeke kurt da,navê xwe bı helbest,serpêhati û roman û tiyatroyêni xwe va lı temamîya Fransayê da bihistin.

Çawa tê zanin, Victor Hugo bavê edebiyata romantiki tê naskırın.Lê bı wextê ra efrandinêni rast-bini(Realist) ji daye.

Çawa tê zanin hê iro ji raberzi-

na "Huner jı bo hunerê ye" û "Huner jı bo civatê ye" domdike. Hugo bersiva xwe lı ser vê babetê dı wextê da daye.Ew ne keseki sosyalist bû,lê jı bo pêşketina mirovatiyê, bo wekheviya civaki pir xebiti.Lewra jiyana wi ya siyasi ji heye.Lı destpêkê ew dı nav muhafezekaran da xebiti.Wi usa bawer dıkır ku,xelasiya mirovatiyê,peydakırına wekheviya civaki wê bı destê hêzên rast pêkbê.Lê wi dı paşerojê da dit ku rasti ne usa ye., Piştı ku hukumeta rastê lı ser karcker û zehmetkêşan zordesti û mekanizmeke hişk dani,hêviyaxweji wan bîri.Lı ser vê yekê rûyê xwe jı wan guhast û kete nav republikanan(Komariyan).

Dı salêni 1840'an da lı Fransayê tevgera çini bı awaki fire geşbû .

Sosyalistan û komariyan bı hevra bang lı gel kîrin ku lı diji êrişen burjuvaziyê rawestin.Lı hember vê burjuvaziya firansi,bı hemû hêza xwe êriş bire ser karkeran.Dı bû-yerên 1840'an da,bı hezaran kar-

ker hatin kuştin û 25 hezar kes hatin girtin. Van bûyeran lı ser Hugo tesireke giring hişt. Dı sala 1851'an da, bı hatına cuntayeke leşkeri ra rejimeke dikta hate avakırın. Vê karinê (iktidar), Hugo şande nefiyê û du kurên wi avitne girtigehê. Hugo 19 salan lı Belçikayê jiyana nefityê kişand. Hugo, wê demê gelek belengazi û perişani dit, lê bawariye xwe jı bo rojê azadiyê û vejerina welat wînda nekir. Pişti ku Nopolyonê duwem ji ser hukum hate dûrxistin (4 İl on 1870) Hugo vedigere Fransayê. Gelê Fransız bı hezkirin û tezahurateke mezin, hatına Hugo piroz dike.

Wek me lı jorê ji got, Hugo ne komunist bû û lema tevi tevgêra

1871'an ne bû. Lë ew lı aliyê komünistan bû. Dı 69 saliya xwe da bû mebûs. Jı ber ku nikaribû denge xwe bide bîhistin jı mebûsiyê istifa kır. Hugo parêzvaneki azadiyê xurt bû. Wi lı diji cezayê mirinê xebateke hêja kır. Weha dîgot Hugo: "Cezayê mirinê, nişaneke barbarizmê ye taybeti û bêdawiye" "Her lı kijan cihi cezayê mirinê heye, lı wir barbari û xwinxwari lı ser hukum e. Bı cezayê mirinê hûn dixwazin çi hini mirovan bikin? Kuştinê? .Başe hûn çawa pêwestiya mirinê hindikin? Bı kuştinê!"

Em vi hozanê mezin bı girami  
bı birtinîn û qimetekê hêja dîdinê.

## Mikayilê Reşid

Helbestvan, wergervan û edebiyatzanê Kurd Mikayilê Reşid dı meha Adarê da çû ser heqîya xwe, paşı nexweşike giran ew jı destê mirinê nefiliti û çû dilovaniya xwe.

Mikayilê Reşit, dı sala 1925'an da lı Tîblîsê hatiye dînê. Wi, dı sala 1948'an da dest bı xwendîna zîman - edebiyat kiriye û dı salan dı zaningeha bı navê X. Abovyan da xwendîye û paşê çûye Moskovayê dı zaningeha bı navê Maksim Gorki da xwendîna xwe berdewam kiriye û dı sala 1954'an da xwendîna xwe qedandiye. Wi zîmanê kurdi, ermeni û rusi gelek baş dizanibû, jı ber vê yekê gelek wergerên wi hene. Mikayilê Reşit



wusan ji gelek helbest nîvisandine û dı nav van berevokan da hatîne çapkırın: Dilê Mîn, Pencere, Mîtale, û İsaf. Ew gelek salan ji, dı radyo û programên televêzona kurdi da xebîtiye, dı rojnama "Riya Teze" da kar kiriye. Jı aliyê dîn, ew wusan ji rexnevaniki gelek baş bû lı ser edebiyata kurdi.

# HAMİD BEDIRXAN

CANKURD

Hamit Bedirxan, an ji weke gundi ji lê ra dibêjin "Hemidê Kuto" li gundeki bî navê Şîyi li Kurdistana Suriyê hate dinê. Ew piremêrdeki kurde, wi bî gelek zimanen nivisiye û dînivise ji, wek Trîki, Fransi, Erebi. Ew jî si (30) sali vir da helbestan dînivise, li gelek rojname, kovar û radiyoyan da, efrandinêni wi hatine weşandinê. Sala par ji efrandinêke wi ya mayin hate çapkîrin, navê wê "Lî Ser Riyêni Asiyê".

Mîn, Hamit Bedirxan di sala 1968'an li bajarê Helebê nas kîr. Hîngi ezi bist sali bûm. Çavêni min, li riya nivisarêni wi vebûn û efrandinêni Gogol, Puşkin, Aragon, Lorka, Neruda û Nazîm gelek tesir li ser min hiştin. Wi, di wê demê da gelek helbest dînivisandin, wunda dibûn, di dest dostan da diman û li pişt ra ji kesi nîzanibû, ew li kuda çûn. Lê nave-roka wan, ya ramani zor xurt bû, gelek ciwan bû. Kevneperestan êriş dajotine li ser wi û digotin: "Ew, ji kurdayetiyê dûr ketiye, ew koministe". Wi digot, "Ez ne ji welatê êlê me, ez ji derya nav-netewi têm".

Hamit Bedirxan dûr û dirêj carîna li ser jiyinga Nazîm Hikmet dipeyivi, li ser girtigehan, zindanan gelek tişt ji me ra digot. Helbesten Nazîm yêni li ser im-

peryalizmê ji me ra dixwend, an ji carîna ji ber digotin. Çavêni wi tiji dibûn bî sotin û li berbi sinorê gundê dinêri û digot: "Ezê vegezin Tîrkiyê û helbestan ji zarokan ra bibêjim."

Mala wi rût û biçük bû, lê belê tiji nivisar û defter bû, bî gelek zimanen efrandinêni cihê li mala wi da hebûn. Helbestê wi, yê yekemin bî erebi hate weşandin. Ew helbest li ser berxwedan û cenga sala 1967'an hatibû nivisandin, navê helbestê "Veger ji Vatirlo"bû. Ew helbest gelek salan li bal min ma û paşê wunda bû.

Rexnêni wi li ser parti, hêz serok û xwendevanêni kurd gelek bûn. Bi taybeti li diji wan bir û baweriyêni netewi yêni bê bingehêni çini, wi gelek şer dikir. Lê disa ji gava şerê gelê kurd paşi sala 1975 şkest, çavêni wi tiji hêstir dibû û helbesteke xwe da wilo dibêje: "Ev şeva reş mirina Gîvara tinê bira min."

Di sala 1983'an da, ew ji xwendevanêni ereb û kurd dibêje : "Ez bî erebi dînivisim, lê bî kurdi difikirim, ez ji zarokanra, ji gelên bindest ra û ji tevgerên rizgarixwaza Kurdistana Tîrkiyê ra dibêjim, bir û bawerîya min bî şoreşe mezine."

## SER KOSE - QER KOSE - BER KOSE

Dî demekê sê bira hebûne. Jî wan hersêkan ra hersê kose dihate gotinê. Kose, Ose, Fisose navê wanen yê cuda. Karê hersêyan ji dayên û standina pez û dêwer bûye. Lê gelek ji çev vekiribûne. Gelek ji kesên reben xapan-dibûne. Mêrikeki hin ji wan çev vekiritir û kureki wi xort hebûye. Rojekê kurê mîrik radibe, çêlekeke wana hebûye, ew dîbê "bavo ezê çêlekê bibib bifiroşim". Bavê we dîbe "kurê min tu neçe ezê bibim bifiroşim. Gava ku tu bîçi hersê Kose wê te bixapinin, çêlekê dest here". Kurê mîrik dîbê "na ki dikare bin bixapine". Xort çêleka xwe hildide û dajo ku bîce bajar. Nineki dîce bala xwe dayê ku mirovek derkete pêşya wi û jê ra got: "Xorto, çêleka te pir delale, lê gava ku tu qoçê wê bibiri ewê zêdetir delal bibe û pere ji bike". Ewi awaha ku xort ra got kete serê xort, xort lêxîs her du qoçê çêleka xwe ji şikand, xwin ser çêleka reben ket, rijya. Xort hîneki riya xwe berdewamkir û avê carê ji yeki din derkete pêşya wi, ewê jê pîrskir: "Xorto, çêleka te firotane?" Xort got "belê, firotane." Vê carê Kose dîbêje "Xortote qoç birine, pêwiste ku tu guhê wê ji bibiri çêtir dibe û wê gelek were çav." Xort dîbê: "Tu jî dîl dîbêji?" Kose dîbê: "Erê, ez dîl dîbêjim." Xort ji xwe digihine çêleka xwe û guhê wê jêdike, dajo tê nêzikaya bajr, stuyi şikesti, vê carê ji Kosê sisyan rasti xor-tê kêm aqil tê. Ew ji dîbêje: "Xorto welehi te rewşa çêlekê başkiriye. Pêwiste tu dêla wê jê biki, ew çax yê bê guh, qoç û dêl be, çêleka teyê bibe tişteki hêja. Jî ber ku çêleka kesi wisa nine. Xénci ya te." Xortê reben dêla çêlekê jêdike, çêlek xwinê da dîbine, mês û moz digirine çêlekê....

Xort çêleka xwe bire nava cihê firotanê. Ew gelê wê derê lî ser xort civyan û pê kenyan gotin: "Kuro ev çi yeke te ani serê çêleka reben". Hemîyan tînazên xwe pê kîrin. Xort zîviri berê xwe da mala bavê xwe, hate malê, gava bavê wi çêlek dit, baş zanibû ku Kosa wisa anîye serê kurê wi. E din bibe, dîbê "kurê min ez bavê teme, ezê wana bikim haliki geleki nebaş. Bavê xort du hev zêra jîna xwe distene û radibe kerê xwe suwar dîbe dîce nêzkayi bî Kosê mezîn bike, zêreki dixe binê dêla kerê, gava tê ber Kose çôkê lî kerê dixe, ker dêla xwe lî ba dike û zêr bin dêla kerê da dîkeveve erdê. Xwedi kerê dîbêje, "Ey mirat te ez kuştım, pir zêr teda dîkevin. Kose ji bî çevê xwe dibine ku zêr ji bin qoça kerêda hate xarê, ew xwe digihine her du bîrayêñ xwe yê din, dîbêje, "Werin emê kera vi mîriki jê bistinîn, bo me xîzneye. Şuna heriye zêra dîke". Hersêk Kose dîcine gel xwediyê kerê, dîbêjin: "Bîra tu çi dîxwazi bo kera xwe, evê kerê bifiroşe me." Xwediyê kerê perê xwe digre û kerê dîde Kosan. Kose dîbêñ, "Ka bêje xeysetê kerê û kırametê wê çine, pêwiste ku embîzanbin". Xwediyê kerê dîbêje, "Hûnê gurseki oncê û tûres ceh bikine ber kerê, ava wê dayine ber, bîni jî kulav û xaliçe raxin, lê birnekîn hertim kuleka bîgrin,

bila cihê kerê taribe". Kose bawer dîkîn û wi jî xwe ra dîkîn bîra, destê bîratiyê dîdîn hev, xatîrê xwe dixwazîn û rîdikevin dîçine malêñ xwe. Kerê dîdîne bîrayê mezîn, dibêjîn "Ev roj dora teye". Kosê mezîn ji kerê dîke o-dekê, once, ceh û avê dîde ber kerê û kulekan serda dîgre. Xewa wi nayê, sîbê zû radîbe dîçe deri vedîke bala xwe dîdê, çi mirata kerê hema êvarda xariye û kîrye ters berdaye, yek zêrek tuneye dî nav ters da. Ew din dîbe, wê navberê da birê duwemin tê ser kulekê bang dîke bîrayê xwe dîbê: "Çawane zêr zaf hatîne xarê?" Kosê mezîn wi dixapine dibê: "Mala te xirab nebe jî êvar da zvr kîrine". Ew dîbe, "Bîra dora mîn be, ez kerê bîbîme malê". Kosê mezîn dîbê, "Erê, em birê hevdune, bila rojekê ji bo te zêra bike". Ew kerê dîgre û dîçe mala xwe, ew ji wek bîrayê mezîn once, ceh û avê tuje ber kerê dîke û kulekan serda dîgre. Jî şabûna lîye ku bifire. Sîbê zû dîçe dînhêre çi qûçek ters heye, zêr mîr tune. Fam dîke ku hatîye xapandin, lê deng nake. Bîrayê çûk tê dîbê: "Kose bîra çawane şansê te?" Kose dîbê, "Rasti ji cih tune ez zêra bîkmê" Kosê sêwemin dîbê, "Ka rojekê ji bîdîn bila bo mîn ji hînek zêr bike". Kosê duwemin dîbê: "Hilde bîbe, rojek ji bo teye, tu ji xwedi zêr be." Bîrayê piçûk kerê dîbe dîçe, em serê we nehêşinîn. Ew ji hemi tiştan dîde kerê, sîbê dîçe xênci ters tiştek tîneye. Êdi herdu Kosê dînêherin ku tişteki nabêje. Hersêk têne rûyê hevdû dibêjîn, "Wele xwedîyê kerê em xapandin, werin zû em herin perê xwe jê bistinîn, kera wi şûnda bîdnê. Bila hesê Kose dî rîda werin emê ji werinne dora xwedîyê kerê, ka ew çi dîke. Pêşdaxwedîyê kerê ji dizane ku sê roj bori zêr nekir, hersê Koseyê werin. Dîbêje jîna xwe, "Qizê tu iro xwarînê, ku mîn jî te ra gotin wan xwarînan çêke, hal mesela mîn Kosa bî vi a-wayiye". Jin dîbê: "Mêrik, tu qe şaişa meke ezê çêkim". Mêrik ji du hev roviyê wi hebûne, yeki mal da girê dîde û yeki ji hildide dîçe cot, Ew lî ze-viya xwe cotê xwe dajo, bala xwe dîde hersê Kosê wêda hatîn. Gava ku Kosan dîbîne cotê xwe berdîde û direve dîçe pêşîya Kosa dîbê: "Wey gelî bîra hûn ji wêra heta vira ling bî ling ser serê mîn hatîne". Qe nahièle Kose devê xwe vekîn û dîbêje: "Rovi zû here bêje bermaliya mîn, bê axê gotiye bila xwarînê zû çebîke, ez û hersê bîrayê xwe têne malê. Dema ku çotkar rovi ber dîde, rovi jî xwera berê xwe dîde çiyaki dîçe. Hersê Kose tevê çotkar ba têne mal. Kosan bala xwe danê ku rovik lî wêderê girêdayiye û dema ku xwarîn hatê ber Kosa, bala xwe danê ku belê, ew xwarînen ku çotkar gotibûn ewin çêbûne. Kosa dî dora xwe bêzîkîrin dî guhê hevda gotin: "Werin em pere qe jê nexwazîn, ka em rovi jê bixwazîn, bila bide me". Emê bîşenîne cihê dûr bona deynê xwe pê bîdîn berevkîrin. Hersê Kosan xwarîn nexwarîn, gotin: "Bîra pêwîste tu evi roviyê hanê bîdi me, gelek deynê me lî cihê dûr heye, bila bîce bîne. Cotkar dîbê "bele gelî bîra mîn rovi bî qurbana wekîr, kerem bikin nanê xwe bixun". Dema ku çotkar awaha got, ewana şabûn, gotin: "Bîra debêje emê çawa rovi bisinîn ku bo daynê me bîne". Cotkar dîbê: "Hûnê perê we ser kîye jî rovi ra bêjin û ki lî liqêye ewê here ger dî heft rojan da nehat lî kiderê be roja heyştan mîrin tunebe rovi were malê." Hersê Kose rovi hildigîrin û dîçine malêñ xwe.

Birayê mezin Dibêje: "Deynê min ji zûva li ser yeki Qaqizmanêye, bila rovi pêşyê biçe ewi perê min bine, paşa emê bîşinin cihê mayin". Ewêñ din ji qaim oisir. oesêjir: "Belê bila gotina tebe". Wele Kosê mezin rovi dîşine dîbê: "Here Qaqizman'ê deynê min hilde were". Dema ku ew rovi berdîde rovi nav gunda direve û kûçûk dîdine peyê rovi, êdi bila rovi here ji xwe ra xîlas bîbe. Kose ji sekînine ku rovi perê wana bine, heft roj qediyâ hin rovi nehatiye. Roja heystan ji bori nehat. Hersê bîra gotin: "Cotkar disa em xapandin. Werin emê vê carê serê wi jêkin, ewi gelek em xapandin". Bila evan hersê Kose ji xwera dî rîda werin, emê ji vegeŕine dora cotkar, ka em çi kar û bari dîke bo xwe xîlas bîbe. Ew ji dîbêje jîna xwe, "Ezê gorekê ji xwe ra bîkolim. Ezê kune ki dî gora xwe da bîhêlim û bîkevime gorê. lê dema ku hersê Kose hatin, tu bî kulman li nav serê xweda bîde û bigiri. E-wana ji te pîrs bîkin, çi bûye? Tu sêje "mala we xîrav be, birê we mir yek ji we ber serê birê xwe nebû, lê belê weyseta birê we ji we ra hebû got, dema ku birê min hatin mala min tu ji wana ra bêje bila werine ser gora min. Devê xwe bîkutune axa ser tîrba min, bang min bîkin". Jîna cotkar gotinê mîrê xwe bî cihdine û Kose dukevine hundîrê malê. Bala xwe dîdnê şin heye, jîna birê wan bigiri, jê pîrs dîkin çi bûye? Jimik Dibê "Xweli li webe, ser bîratiya weda. Birê we mir, kesek ji we li ber serê wi tune bû. Çave wi li rîya we da ma, lê gotinê wi hene ezê ji wera ew gotinana bêjîm". Jimik dîbêje: "Merê min gotibû ku hersê birayê min hatin, bila werine ser goristana min, li ser tîrba min bîkin qêrin, ta ku dengê wan hetê guhê min. Hersê Kose radîbin jîna birê xwe dîdine pêşiya xwe û dîçine ser gora cotkar. Lê Kosê mezin gelek qehîribû, beri ewanê mayin ew devê xwe dîke kuna li ser tîrba cotkar û dîke qêrin. Dibê: "Bîrao! Bîrao! Min gor û kefenê te..... te em çawa xapandin, perê me war,". Cotkar kêreki davêje pozê Kose jê dîke. Ew her du destê xwe dîde ser dev û pozê xwe şunda dîce dîbê: "Bêhna gula ji gora wi zebani tê". Birê wi bawer dîkin û ew ji devê xwe dikine tîrba cotkar, kotkar pozê wana ji jêdîke. Ew hersêk dest pêdîkin û gorê dîkolîn, ser vedîkin û cotkar der dîxine der, hildîdin dibîn, qede-reki dûr dîçin dest û lingê cotkar grêdîdin û dûr dîçin bêhna xwe bigrin. Dî wê navberêda şivanek bî bireki ,pez va dî wê derê ra dertê. Dema cotkar şivan li wêderê dit, kire gazi û xwe li erdê dîbetêne, dîbêje: "Wele ez nabim paşa, bileh ez nebim paşa." Şivanê reben ji dîce gel wida dîbêje: "Qîrbân, paşatiye çiye?" Cotkar dîbêje: "Heyran paşatiya vi welati dîdine min, ez naxazîm bo wê ji ez anême vîra girêdame". Şivan dîbêje: "Ezê şuna te da paşatiyê bîkim". Cotkar dîbêje:"Başe, ka dest û lingêñ min vebike". Şivan dest û lingêñ wi vedîke û cotkar dest û lingê şivan girêdide, kulavê wê davêje nava mulê xwe dîde pêşiya bîra pez û dîmeşe. Emê niha ji hersê Kosan bibinîn, ka çi dîkin. Ewana dîzivirin têne nêziki cihê ku cotkar girêdabûn, bala xwe dîdînê wa mîrovê ku wana dest û lingê wi girêdabûn, dîbêje: "Ez nabime paşa" Kose ji dîbêjin: "Ev dine, êdi enê wi bavêjîne golê. Ew ji dîbê ez nabim paşa. Lê nîzanîn ku ew şivanê rebene wêdere. Ewana dîçin şivan davêjin golê. Şivan dîxenîqe, ewana ji

đızivirin û şadibin dibêjin me cotkar wunda kır. Hineki têne bala xwe di-dinê va cotkar pêşîya birek peze û hoke hoka wiye dîmêş. Hersê Kose ewi dibinin şas dibin. Dibêj: "Me tu avêti golê, çawa tu nexeniqi?" Cotkar dibêje: "Xwedê ji we razibe, ez ketim golê min dit ku bî hezaran bî rêz pez yên bê xwedi hene min ji xwera birek pez derani û ez nizanım çawa derke-time rûye erdê". Kose cardin bawer dikin û dibêjin: "Ka werin em ji xwe bavêjin golê da". Dîçine ber golê da, berê birê mezin davêjine golê. Dema ku dibe bilqe bilqa avê, her du Kosê mayin dibêjin xeniqi. Cotkar dibêje na, gelek pez heye bo wêye. Dibê ez kela derxim an kola derxim. Herdu Kose dibêjin raste û herdu ji xwe bî hevra davêjin golê, dixeniqin. Cotkar ji dîgêhêje mala xwe. Ew mirazê xwe hûn ji bininîn mirazê xwe.

Berevkar : SİPAN

## ÇEND DERBİRİN

Berevkar : VAZGAL

- 1 — Av ronahiye
- 2 — Agirê kulê
- 3 — Agir dîpekkine
- 4 — Bê te xweş nebe
- 5 — Bê gili gotin
- 6 — Bê sewt ketin
- 7 — Ber hev dan
- 8 — Berxê serê lodê
- 9 — Bî kevçi dide hev bî heskê belav  
dike.
- 10 — Canê te zer be
- 11 — Çav badan
- 12 — Çav berdan
- 13 — Dil kîrin
- 14 — Dûdi-bûdi
- 15 — Devra (saya) serê te
- 16 — Dilê min kine kine
- 17 — Devê te şirin be
- 18 — Destê te ne êşê
- 19 — Dilê min naçe
- 20 — Deynê stûyê min be
- 21 — Ez dibêm nêr e
- 22 — Yê rûyê te bibine wê bice bîhûstê
- 23 — Gurê Sibatê
- 24 — Guhê me bir
- 25 — Hela hela teye (xiz xiza teye)
- 26 — Heke lingê xwe guhê xwe we
- 27 — Jî xwe qet xwin bernadi
- 28 — Kayê kevn nede bayê
- 29 — Kum dani seri
- 30 — Kamçiki kîrin

- 31 — Qewl û qîrar
- 32 — Qısa te min bî şekir bîri
- 33 — Qewlê mîrê berê
- 34 — Kumê Xelo li ser Celo kîrin
- 35 — Lîv şelte
- 36 — Min xwe ra nedît
- 37 — Nîg da ser
- 38 — Nanê zîko
- 39 — Nelet li şirê tebê (tebe)
- 40 — Ne xema mine ne dema mine  
Şîqe şîqa benîstê min e
- 41 — Ne mal heye talan bîbe  
Ne iman heye şeytan bîbe
- 42 — Perê dînyayê
- 43 — Kera bî guh neke
- 44 — Qureyê zîk birçi
- 45 — Qîjikê
- 46 — Reng xeyidi
- 47 — Rû be rû
- 48 — Rabû rûyê min sekini
- 49 — Roda çûyên
- 50 — Serê min ketiye xaxê giran
- 51 — Serda Çûyin
- 52 — Stûyê te bîşkê
- 53 — Sêwiyê ber diwaran
- 54 — Şax vedan
- 55 — Xem xwarin
- 56 — Xwin û goşt tevi hev bûye
- 57 — Xerê wayê nebîne
- 58 — Xweli ser
- 59 — Xêrê jî te ne binim
- 60 — Xil û xweli

# JI NAV WEŞANAN



Weşanxana Roja Nû, du pirtûkên nû weşand: "Tarixa Kurdistan cildê yekem" ya Cigerxwin û "Aliko û Baz" ya Baran.

## \* TARIXA KURDISTAN –1

Jî 220 rûpelan pêktê. Dî destpêkê da, mamoto Cigerxwin li ser cografiya, ziman û ola kurdi radiweste. Paşê, ji bûyina Isa hetani piştî islamiyetê, li ser diroka Kurdistanê dimivise.

## \* ALIKO Û BAZ

"Aliko û Baz" çirokeke şerin e ku li welatê me, kal û pir û dayik, wê ji zarokan ra dibêjin. Ev çirok niha derbasi ser rûpelan bû û kete nav literatura me. Baran, ew bi zimaneki zelal û sivik nivisiye ji bo cuwan û zarokên Kurdistanê. Pirtûk bi wêne (şikil, desen) ye.

## DENGÊ DIL

Gelek efrandinê Emerikê Serdar dî nav pirtûka bî navê "Dengê Dil" da hatin ciwakîrin û lî Rewanê hate çapkîrin.

## XECÊ Û SİYABEND

Serpêhatiya gel "Xecê û Siyabend" li Elmanya Federal bî zimanê turki û bî zimanê elmani hat weşandin. Ev serpêhatiya gel û şaxêن wê, ji aliyê Huseyin Erdem da hatiye bervkirin û bî destê wi hatiye nivisandin. Dî nav rûpelên pirtûkê da wusan ji, pêşgotinak bî turki û elmani cih girtiye.

## JİN

Kovara "Jin" ya ku dî navbera salêن 1918 - 1919'an da li Stenbolê hatîbû çapkîrin, vê carê ji aliyê M.E.Bozarslan da, ji nû va hate çapkîrin. Ji aliki da zimanê kovarê hatiyê zelalkîrin û ji bo xwendevanê kurdi şirovekirin û pêşgotineke dirêj bî herdu zimanian pêva hatiye çapkîrin.

"JÎ"

Ü

## "KURDISTAN LI DILÊ MIN DA YE"

Li Swêd du pirtûkên Ferhad Shakely yên helbestan hatin weşandin. Her du ji bî kurmanciya jêrê hatine nivisandin. Ji wan "Kurdistan li dilê min da ye" bî tipêñ latini hatiye nivisandin.

## TU

Jî aliyê Mehmet Uzun da romanekê bî navê "Tu" li Swêdê derket, ev romana bî zimanê kurdi hatiyê nivisandin.

## CİGERXWİN

### KEÇA KURD



Keçê rabe, seri hilde, dî vê çaxê weha nabi,  
Binêr, jin çûne ezmana, heta kengê dî xewda bi,  
Dixwazîm zû bixûni xweş, jî ser rû raki çara reş,  
Tu gavan pêşda bavêji, weki Ander û benda bi,  
Çine ev çarik û pêçi, dî rextada xwe rapêçi,  
Bî destê te kelaşnikof, bera zana û xwenda bi,  
Jî dijminra tu mérkuj bi, dî hindurda tu paqîj bi,  
Ne xav û bê xuy û riji bi, meger çendan lî gundan bi,  
Berê gundi û recber bi, welatparêz û perwer bi,  
Sîpi bi yan tu esmer bi, weki fanos û finda bi,  
Weki findê dîki roni, lî bajêr yan lî gund rûni,  
Diya şêr pîlinga bi, hevala ser bilind bi,  
Erê şoxê, erê şengê, bî hevra em herne cengê,  
Girêdayê heta kengi bîmini dil û wînda bi,  
Dixwezîm ko weki min bi, bî dijminra tu dijmin bi,  
Dî cengêda weki cîn bi, ne rengê bûm û kunda bi  
Were, xûşkê, tu zû rabe, dî şêrda rengê şêra be,  
Berê alameye rengin lî ser şaxan te hilda bi,  
Dî rojêن şahi û cejnê, binêrim ez lî wê bêjnê,  
Bî hevra em herne dansê, tu padışahê rînda bi,  
Şêrin û nazîk û rînd bi, şeker lîv û sîpi zend bi,  
Were, em hev bikin hemêz, bere fetwa xwe min da bi,  
Keça zana û jêhati, bîbe parti-Demoqrati,  
Bera disa tu şêrina dilê xorta û Seyda bi.



PHOTO. PARVAND. SANANDAJ. IRAN

BIHA: 10:- kr.